Fuad Husên li ser pîrsa nûçegihanê Rûdawê yê Washington got:

"Hikûmeta Iraqê ji bo berpirsên Tirkîyê û Sûriyeyê li Bexdayê bicivin û asayîkirina pêwendiyên her du welatan gotûbêj bikin însiy-

atîf wergirtiye.

Lihevkirineke destpêkî li ser civînê hatiye kirin lê dîrok nehatiye diyar kirin. Ez vegehiyam Bexdayê, em dê rojekê diyar bikin."

Me bi Wezîrê Karên Derve yê Sûriyê û Wezîrê Karên Derve yê Tirkîyê re jî hevdîtin pêk anî.

Serokkomarê Tirkîyeyê Recep Tayyîp Erdogan di lûtkeya NATOyê de li Washingtonê eşkere kiribû ku wî berî du hefteyan ji Beşar Esed xwestibû ku bi wî re hevdîtinê bike. "Min Esed dawet kir"

Her wiha Erdogan di berde-

wamiya axaftina xwe jî de wisa gotibû:

"Min ji birêz Esed re got, 'yan were welatê me, yan jî li welatekî sêyem em hevdîtinê bikin' min ev bangawazîya xwe beriya du hefteyan kiribû û li ser wê mijarê min Wezîrê Karên Derve yê welatê xwe erkdar kiriye.

Ew jî ligel aliyên berpirsiyar gotûbêjan dike. Bi hêviya Xwedê, em dê wê rewşa derbas bikin û em dixwazin qonaxeke nû dest pê bikin." Divê were gotin piştî şerê navxweyî yê Sûriyeyê yê sala 2011an, Tirkîyeyê piştgirî da komên çekdar ên mixalefeta Sûriyeyê ku hewl didin dawiyê li desthilata Beşad Esed bînin.

Leşkerên Tirkîyeyê û çekdarên mixalefeta Sûriyeyê herêm û bajarên wekî, Efrîn, Serê Kaniyê, Girê Spî yem Rojavayê Kurdistanê û El Bab, Ezaz û Idlibê yê Sûriyê xwedî hêz in. Serokê Sûriyeyê Beşar Esed beriya bi demekê eşkere kiribû ku eger Tirkîyê ji nav xaka Sûriyeyê vekişe û rêzê li serweriya Şamê bigire dê dest bi danustandinan bikin.

PWK: Em Elîşêr Beg û Zerîfe Xanimê Bi Rêzdarî Bi Bîr Tînin

Îro 87yemîn salvegera qetil kirina serok û rêberê netewî yê Tevgera Netewî ya Kurd a Koçgîrîyê Elîşêr Beg û hevjîna wî Zerîfe Xanimê ye.

Îro 87yemîn salvegera qetil kirina serok û rêberê netewî yê Tevgera Netewî ya Kurd a Koçgîrîyê Elîşêr Beg û hevjîna wî Zerîfe Xanimê ye.

Serokê Tevgera Netewî ya Kurd a Koçgîrîyê Elîşêr Beg û Zerîfe Xanim hevjîna wî ya têkoşer û kadroyeke rêber a Tevgera Netewî ya Kurd a Koçgîrîyê, piştî şikestxwarina Tevgera Koçgîrîyê, teslîmî Dewleta Tirkîyeyê nebûn, bi salan li çiyayên Dêrsimê jîyan.

Dewleta Tirkîyeyê li Dêrsimê amadekarîya jenosîdeke berfireh dikir. Û gava ewil jî dixwest Elîşêr Beg û Zerîfe Xanimê bikujin.

Kesekî bi navê Zeynel ê ku

Advertisement for the PWK (Partîya Welatparêzên Kurdistanê) featuring a portrait of Elîşêr Beg and Zerîfe Xanim, a map of Kurdistan, and a lit candle. Text includes: "Em Elîşêr Beg û Zerîfe Xanimê Bi Rêzdarî Bi Bîr Tînin", "Ma Elîşêr Beg û Zerîfe Xanimê Bi Hurmed Yad Kenê", "Alîşer Bey ve Zarife Hanımı Saygıyla Anıyoruz", and "PARTÎYA WELATPARÊZÊN KURDISTANÊ (PWK)".

kirivê Elîşêr Beg bû, herweha sîxur û nokerê Dewleta Tirkîyeyê bû, roja 09.07.1937an, serê Elîşêr Beg û Zerîfe Xanimê jêkir û bir teslîmî Dewleta Tirkîyeyê kir. Heta nuha jî kes nizane ka termên

Elîşêr Beg û Zerîfe Xanimê li ku derê ne.

Em di 87emîn salvegera şehadeta wan de Elîşêr Beg û Zerîfe Xanimê û hemû şehîdên Kurdistanê bi giramî bibîr tînin.

Serok Barzanî: Endam û kadroyên PDK'ê bi xweragiriya xwe bûne hêviyên gelê Kurd

Serok Mesûd Barzanî îro 11ê Tîrmehê bi beşek ji astên cuda yê rêxistina Liq û



Navçeyên Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) re civiya.

Baregeha Barzanî belav kir, Serok Barzanî di civînê de spasiya ked û xebata endam û kadroyên PDK'ê kir ku di qonaxên curbicur de bi xweragiriya xwe, bûne hêviyên gelê Kurd.

Serok Barzanî amaje bi dîroka PDK'ê kir û tekezî li ser wê yekê ku PDK ji bo vejandina hêvî û xwebaweriya gelê Kurd dirust bûye û amûrek e ji bo xizmetkirina gelê Kurdistanê û her dema PDK'ê bihêz bûbe, Kurdistan jî bihêz bûye.

Serok Barzanî di beşeke din gotara xwe de, ronahî xiste ser serdana xwe ya hefteya borî bo Bexdayê û hokarên serdan û hevdiinên xwe yê bi aliyên Iraqî re eşkere kirin.

Her di vê hevdiinê de, Serok Barzanî derbarê rewşa rêxistinên navxwe yê PDK'ê de ronî û rênimayiyên pêwîst ji beşdaran re pêşkêşî kirin.

Şirovekarekî siyasî: Amerîka ji Iraqê dernakeve

Şirovekarekî siyasî dibêje, Amerîkayê bi ti awayî pirsra vekişîna hêzên xwe ji Iraqê



gotûbêj nekiriye û plan dike ku hêzên xwe mîna Japonê, li Iraqê jî bihêle.

Mijara vekişîna hêzên Amerîkayê di qada siyasî ya Iraqê de cihê nakokiyê ye, piştî sê gerên danûstandinan, hîn jî ji tiştê ku jê tê hêvîkirin, ne bi dilê Iraqîyan e. Rayedarên Amerîkî tekez dikin ku ew mijûlî nixandina metirsiya DAIŞê ne, da ku careke din metirsiya DAIŞê dernekeve holê.

Piştî çendîn civîn û danûstandinên di navbera şanda bilind a leşkerî ya Iraq û Amerîkayê de, kar ji aliyê sê komîteyên bo nixandina rewşa ewlehiyê, sînor û şiyarên hêzên ewlehiyê yê Iraqê hat kirin. Serokwezîrê Iraqê û Cîgirê Alîkarê Wezîrê Berevaniya Amerîkayê ji bo karûbarên Rojhilata Navîn civiyan. Sûdanî tekezî li ser pêwîstiya bidawînanê erkê Hevpeymanîya Navdewletî ya li dijî DAIŞê kir, lê ligel wê jî daxwaza welatê xwe ji bo bihêzkirina pêwendiyên dualî jî dubare kir. Li hemberê, şanda Berevaniya Amerîkayê got, ew dê zêdetir warên çekdarkirin, ewlehî û bihêzkirina hêzên şerker ên Iraqê bi pêş bixin û herwiha piştewaniya ewlehî, serweriya Iraqê, geşepêdana aborî û pêşvebirina hemû di waran de bikin.

Li ser egera mayîna demdirêj a hêzên Amerîkayê li Iraqê, şirovekarê siyasî yê Iraqî Seîd Bedrî di wê baweriyê de ye, Amerîka plan dike ku senaryoya leşkerî xwe yê li Japonyayê dubare bike û leşkerên xwe li Iraqê bihêle.

Nêçîrvan Barzanî bi telefonê ligel Serokomarê nû yê Îranê axivî û pîrozbahî lê kir

Nêçîrvan Barzanî Serokê Herêma Kurdistanê, bi helkefta hîlbijartina Mesûd Pizîşkiyan wek Serokomara Îslamî ya Îranê pîrozbahiyê lê kir û di kar û erkên wî da hêviya serkeftinê jê ra xwest.

Nêçîrvan Barzanî amadeyî û xwesteka Herêma Kurdistanê û gelê wê ji bo pêşxistina peywendiyên dostane yê demdirêj û hevkarîyên hevbeş di hemû waran de bi Komara Îslamî ya Îranê re li ser esasê rêzgirtin û berjewendiyê hevbeş û cînariya baş ku bibe sedema geşepêdana her du gel û welatan dûpat kir.

Serokê Herêma Kurdistanê ev yek jî piştrast kir ku serkirdayetiya Serok Pizîşkiyan dê dostaniya di navbera herdu aliyên de kûrtir bike, her wek di civîna dawî ya digel cenabê Rêberê Şoreşa Îslamî û berpirsên payebilind yê Komara Îslamî ya Îranê xwesteka Herêma Kurdistanê ya ji bo hema-



hengiyê nîşan da û ji bo paşerojeke baştir ya her du welatan herwesa ji bo aştî û aramiya li navçeyê.

Ji aliyê xwe ve, Mesûd Pizîşkiyan, Serokê hîlbijartî yê Komara Îslamî ya Îranê, xweşaliya xwe bi peywendî û pîrozbahiyên Serok Nêçîrvan Barzanî



nîşan da û tekezî li ser xwesteka Komara Îslamî ya Îranê ji bo pêşdabirina têkeliyan digel Iraq û Herêma Kurdistanê kir û balkişand li ser peywendiyên dostane yê dêrîn yê gelên Îran û Komara Îslamî ya Îranê bi Herêma Kurdistanê re kir.

Amêdî: Ji ber şerê PKK û Tirkîyeyê bi hezaran donim zevî şewitîn

Ji ber şerê gerîlayên PKK'yê û Artêşa Tirkîyeyê top li dorûberê gundên navçeya Amêdiyê dikevin û bi hezaran donim zevî, rez û bîstanên xelkê şewitîn. Li herêma Amediyê nêzikî 2 hefteyan e şer û pevçûnên dijwar di navbera PKK û Tirkîyeyê de hene.

Ji ber şer agir bi daristanên herêmê ketiye û agir derbasî nava zeviyên cotkarên herêmê jî bûye.

Tahîr Sadiq xelkê gundê Kevinemjê ye û bi çavekî tije hêsiar wiha got:

"Ez mafdar im yan na? 10 şehîdên min hene. Tevî vê jî kes nizane bê anîha mala min li kû derê ye. Ez mafdar im yan na?"

Çend gundên dorûberê yê wekî Mijê, Dêreşê, Girgaşê, Sipîndarê û Kevinemjê ji ber şerê PKK û Tirkîyeyê dişewitin.

Muxtarê gundê Mijê Azad Hemzû eşkere kir nêzikî 2 hezar û 500 kes li 4-5 gundên herêmê hene.

"Gundî xwedî zevî û rez in"

Muxtar Azad Hemzû behsa şewatê kir û wiha got:

"Her kes xwediyê mal û milk û zeviyan in. Hin kes xwediyê 10, 20 yan 30 donim zeviyên in. Hinek kesan simaq çandiye.

Hinek kesan fistiq çandiye hinek kesan darên wan ên behîvan hene."

Li gorî zanyariyên ajanasa Rûdawê, her çend metirsî li ser jiyana xelkê hebe jî gundiyan herêmê ji bo vemirandina agir çûne nava rez û zeviyên xwe.



Ter û hişk çî dikeve ber agir dişewitîne, topbaran û şerê berdewam wisa kiriye ku agir her li herêmê berdewam bike.

Li gundê Dêreşê 3 mal mane û yek ji wan jî ya Xurşîd Şêro ye.

"Her tişt şewitî çî tiştêk nema"

Xurşîd Şêro behsa behsa jiyana xwe ya li gund kir û wiha got:

"Em nikarin karekî bikin û em nikarin ji malên derkevin nikarin ti tiştêkî bikin.

Li aliyekî agir e li aliyê din gulebaran e û li aliyê din topbaran e û vê yekê wisa kiriye ku em di malê de asê bimînin.

Ti berhemeke me ya cotkariyê nemaye hemû şewitiye bîstanên me rêzên me şewitîn. Ne giwîj û kizwan

maye ne jî tiştêkî din ti tiştêkî me nemaye."

Li çiyayên Metîn û Gareyê yê Amêdiyê nêzikî 2 hefteyan e şer û pevçûnên dijwar di navbera PKK û Artêşa Tirkîyeyê de heye.

Ji ber şer 162 gund vala bûne

Ji ber şerê li herêmê bi hezaran donim zevî şewitîne û şewat li nava hin zeviyan berdewam dike û dûxan ji herêmê bilind dibe.

Berpirsê Tîmên Aştîyê yê Civakî (CPT) Kameran Usman; ji ber şerê Tirkîye û gerîlayên PKK'yê 162 gundên li ser sînor ên Herêma Kurdistanê hatine valakirin.

Li gorî gotina Kameran Usman, metirsî heye 602 gundên din ên li herêmê jî vala bibin.

Serokomarê nû yê Îranê Mesûd Pizîşkiyan peyamek ji cîhanê re şand: Stratejiya berevaniya Îranê çekên Etomî tê de nîne

Îro 13.07.2024, Serokomarê Îranê yê nû peyamek bi navnîşana "Peyama min bo Cîhana nû" bi zimanê Înglîzî belav kiriye û tede pesna siyaseta dostane a li gel Çîn û Rûsyayê dike û nivisiye: "Çîn û Rûsya di demên zor û zehmet de herdem li gel me bûn. Rûsya hevpeymaneke girîng û stratejî û cîranekî Îranê ye û wê kabîneya min pêbendbe bi berfireh kirin û xurtkirina hevkarîyên di navbera me de." Mesûd Pizîşkiyan di peyamekî ku rojnameya Tehran Times belav kiriye de renxe li siyaseta Amerîkayê digre û dibêje: "Hikûmeta wî amadeye ji bo gotûbêja avaker a li gel walatên Ewropî, herwaha rexna jî li amerîka girt û daxwaz kir ku li hember Îranê siyaseteke nû bigre dest."

Herwaha dibêje: "Pêwîste Amerîka rastiyê bizane û têbigêje, Îran bersiva zext nade û di rêbaza berevaniya Îranê de çekê nukleer nîne."


Pizîşkiyan di hîlbijartinên Îranê de li

ser namzedekî tundrew serkeftin bi dest anî û tekezî li wê kiriye ku Îran hewla bidestxistina çekên Etomî nade û dibêje, "Tehran pêwendiyên xwe li gel cîranên xwe berfireh dike û li gel Ewropayê gotûbêjan dike."

Herwaha di wê peyamê de, kelecana xwe bo hemahengiya li gel Tirkîye, Siûdiye, Oman, Iraq, Behrên, Qeter, Kwêyt, Îmarat û welatên din yê herêmê aniyê ziman ji bo kûrkirina pêwendiyên aborî û bi hêzkirina pêwendiyên bazirganî û pêşvebirina veberhênanên hevbeş, rûbirûbûna pîrsgrêkên hevpar û ber bi diyalog, avakirina bawerî û pêşveçûnê.

Herwaha got: "Gelê Îranê bawerîya xwe bi min da ku ji bo peywendiyên avaker di asta cîhanî de bêwestan bixebitim û li ser maf, rûmet û rola xwe ya layîq li navçe û cîhanê de israr bikim."

Herwaha dibêje, "Ez bang li hemû kesên ku dixwazin tevî me bibin û beşdarî



vê arka dîrokî bibin dikim."

Pizîşkiyan 69 saliye, bijîşkê emelyatên dile, soza teşvîqkirina siyaseteke derve ya piratîk daye, herwaha soza daye tengezariya li ser gotûbêjên derbarê zindî kirina rêkeftinê Etomîyan yê sala 2015 kêm bike ku demeke asê meye, herwaha-soz daye ku azadiya civakî û hêjahiya siyasî baştir bike. Lê gelek Îranî bi şiyana doktorê xwe ji bo cîbicîkirina sozên ku wî di dema kampanyaya hîlbijartinê de dabûn welatîyên xwe, guman dikin.

Serokwezîr Mesrûr Barzanî pêşwaziya şandekê Amerîkayî dike

Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê pêşwaziya şandekê Karûbarên Rojhilata Navîn Daniel Shapiro kir.



Amerîkayî dike. Cîgirê Alîkarê Wezîrê Bergiriyê yê Amerîkayê, ku serokatiya wê şandê dike, spasiya bizav û xebatên Serokwezîr Mesrûr Barzanî yên berdeyam ji bo biserxistina çaksaziyan û yekkirina hêzên Pêşmergeyan dike.

Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî îro pêşwaziya şandekê Amerîkayî bi serokatiya Cîgirê Alîkarê Wezîrê Bergiriyê yê Amerîkayê ji bo

Di wê civînê de ku Balyoza Amerîkayê li Îraqê Alina Romanowski û Fermandeyê Giştî yê Hêzên Hevpeymanan li Îraq û Sûriyeyê General Joel Vowel û Birêveberê Karûbarên Îraq û Sûriyeyê li Civata Ewlehiya Niştîmanî ya Amerîkayê Nichol Softness jî tê de berhev bûbûn, danûstandin li ser dawî guhertin û pêşhatên Îraq û deverê hatin kirin.


Cîgirê Alîkarê Wezîrê Bergiriyê

yê Amerîkayê piştevaniya welatê xwe ji bo Herêma Kurdistanê û hêza Pêşmergeyan tekez kir, amaje da ku Herêma Kurdistanê hevpareke giring û stratejî ya Amerîkayê ye û herwesa xwasteka welatê xwe ji bo zêdetir pêşxistina alîkarî û hevahengiya ewlehî û serbazî bi Hikûmeta Herêma Kurdistanê re jî diyar kir.

Mijara tewerekî serekî yê wê civînê danûstandinên li ser pêşkeftinên girêdayî çaksaziyan Wezareta Pêşmerge bû. Di vî warî de Cîgirê Alîkarê Wezîrê Bergiriyê yê Amerîkayê spasiya bizav û xebatên berdeyam ên Serokwezîr Mesrûr Barzanî ji bo biserxistina çaksaziyan û yekkirina hêzên Pêşmergeyan kir. Amaje jî da ku Amerîka û Hevpeymaniya Navdewletî dê li ser piştevanîkirina hêza Pêşmergeyan ji bo rûbirûbûna gefên terorê û xasma yên terorîstên DAIŞê berdeyam bin. Serokwezîr Mesrûr Barzanî spasî û rêzên Herêma Kurdistanê ji bo piştevaniya berdeyam a Amerîkayê diyar kirin, herwesa tekez li ser mukomkirina peywendiyên dualî di warên cuda cuda de jî kir.

Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê pêşwaziya Şewirmendê Ewlehiya Niştîmanî ya Îraqê dike

Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Şewirmendê Ewlehiya Niştîmanî ya Îraqê



danûstandinan li ser dawî guhertin û pêşveçûnên rewşa ewlehiyê ya Îraqê bi giştî dikin û tekezê li ser giringiya bicihanîna lihevkerina Şingalê û asayîkirina rewşa wê deverê dikin.

Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî îro pêşwaziya Şewirmendê Ewlehiya Niştîmanî ya Îraqê Qasim Arcî kir.

Di wê civînê de, her du aliyan dîtin û nerînên xwe li ser dawî guhertin û pêşveçûnên rewşa ewlehiyê ya Îraqê bi giştî li hev guhertin, herwesa tekez li ser pêşxistina alîkarî û hevahengiya navbera Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Hikûmeta Îraqê ji bo rûbirûbûna metirsî û gefên terorê û parastina ewlehî û seqamgiriya deverên sinorî kir.

Di tewerekî din wê civînê de, her du alî li ser giringiya bicihanîna lihevkerina Şingalê û asayîkirina rewşa wê deverê hevnerîn bûn.

Wezîrê Navxwe: PKK sedema nearamiya navçeyên sinorî yên Herêma Kurdistanê ye

Wezîrê Navxwe yê Hikûmeta Herêma Kurdistanê ragihand, Hewlêr û Bexda li ser



bidawîkirina nearamiya navçeyên sinorî yên Herêma Kurdistanê li hev kirine.

Wezîrê Navxwe yê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Rêber Ehmed îro 13ê Tîrmehê derbarê serdana dawî ya Şewirmendê Asayîşa Niştîmanî ya Îraqê Qasim El-Arcî bo Hewlêrê û aloziyên di navbera artêşa Tirkîyeyê û Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) de li navçeyên sinorî, bersiva pirsên peyamnêrê Kurdistanê dan.

Şewirmendê Asayîşa Niştîmanî ya Îraqê Qasim El-Arcî roja 11ê Tîrmehê li Hewlêrê ligel Serokwezîr Mesrûr Barzanî civiya û derbarê zêdebûna aloziyan li navçeyên sinorî yên Herêma Kurdistanê, cîbicîkirina rêkeftina Şingalê û çend mijarên din gotûbêj kirin.

Rêber Ehmed li ser naveroka hevdîtina Mesrûr Barzanî û Qasim El-Arcî got, "Civîna baş û berhemdar bû. Herduyan li hev kir ku divê nearamiya ku li ser sinoran heye, bi dawî bibe. Herwiha biryar hat dayîn ku em sedemên nearamiyê bikolin, ne encaman."

Li gorî Wezîrê Navxwe, sedema nearamiya navçeyên sinorî yên Herêma Kurdistanê, hebûna PKKê ye û pêwîstî bi wê yekê heye, ku divê li Îraqê siyaseteke niştîmanî ya yekgirtî bigire. Da ku her kes di bin sîwana ve siyaseta giştî û niştîmanî de, bi vî pirsê re mijûl bibe û derbarê vî mijarê de çend nerînên cuda çênabin." Rêber Ehmed got jî: "Hebûna PKKê hincetan zêdetir dide Tirkîyeyê ku zêdetir baregehên leşkerî li Herêma Kurdistanê bi cih bike."

Wezîrê Pêşmerge: Em gavên cidî ji bo yekxistina hêzên Pêşmerge davêjin



Wezîrê Pêşmerge dibêje, pêwendiyên wan bi Wezareta Berevaniya Îraqê re baş in û ew gavên cidî jî ji bo rêxistin û

yekxistina hêzên Pêşmerge davêjin.

Wezîrê Pêşmerge yê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Şoreş Îsmail di merasima derçûna hijmarek efsereyan wezaretê ji xula heştam a Koleja Erkanê ya li bajarê Çwarqurna got, derçûna van efsereyan dê hêzeke zêdetir bide Wezareta Pêşmerge di şerê li dijî terorê û gefên wê de.

Şoreş Îsmail diyar kir: "Di qonaxa niha de, Wezareta Pêşmerge ji bo çaksazî, rêxistin û yekxistina hêzên Pêşmergeyan Kurdistanê gavên cidî diavêje."

Derbarê hevahengiya wan ligel hêzên ewlekariya Îraqê de, Wezîrê Pêşmerge tekez kir: "Pêwendiyêke dirust a Wezareta Pêşmerge ligel Wezareta Berevaniya Îraqê heye."

Herwiha eşkere kir, salane bi dehan efsereyan Pêşmerge bi hevahengî li gel hevpeymanên Hikûmeta Herêma Kurdistanê ji bo beşdariya di kursên leşkerî de bo derve tîn şandin. Li navxwe jî, efsereyan Wezareta Pêşmerge li Kolêja Erkana Bexdayê û kolêjên din ên leşkerî beşdarî kursan dibin."

Rojnameya El-Ereb: YNK û Bafil Talebanî li Bexdayê hatiye marjînalîzekirin

Rojnameya El-Ereb di raportekî de behsa pêwendiyên di navbera Hewlêr û Bexdayê û Enqerê dike û amaje bi serdana Serok Barzanî ya bo Bexdayê dike, ku bi awayekî bûye, hemû aliyan hewila nîzîkbûnê dane. Di hemandemê de behsa wê jî kiriye ku YNK û Bafil Talebanî li Bexdayê hes bi marjînalîkirinê dikin. Rojnamê behsa wê kiriye ku dema ku Serok Barzanî li Bexdayê bûye, Bafil Talebanî Çûye Bexdayê, lê marjînalî kirina wî bi awayekî bûye ku nekariye beşdarî civînên rêveberiya dewletê bibe, ku di heman demê de YNK di avakirina hikûmeta Îraqê de, di nav aliyan beşdar di hevpeymaniya rêveberiya dewletê de beşdar dibin. Rojnameyê diyar kiriye, Partiya Demokrat a Kurdistan di navxwe û derve de ji bo damezrandina pêwendiyekî siyasî kar dike, ew jî bi rêya nîzîkbûna li gel Partî û hêzên desthilatdar ên Îraqê yên herî dîyar, ji aliyekî din ve rêkeftina ligel Tirkîyeyê û bihêzîkirina peywendiyên ligel Îranê bûye sedema nîgeraniya YNKê, ku di wê baweriyê de ye, ku wan peywendiyên helwesta wan daxistiye û berovajî berjewendiyên wan in. "YNK bi tevahî xwe wek marjînalî hîs dike, di heman demê de Tirkîyeyê piştî xwe bi YNKê digre û bi wê yekê tohmetbar dike ku li Silêmaniyê hembêz bo PKKê vekiriyê û asankariyê dide çekdarên PKKê. Herwaha guhetina helwesta Îraqê a li hember PKKê, ku çend meh beriya niha hikûmeta Îraqê bersiva daxwaza Tirkîyeyê daye û PKKê weke "Rêxistîneke Terorîstî" binav kiriye.

Rojnameyê behsa serdana vî dawiyê a Serok



Barzanî ya bo Bexdayê kiriye û bi qonaxêke nû, ji bo baştirkirina peywendiyên di navbera Herêma Kurdistanê û piraniya hêz û aliyan ereb ên şîte yên Îraqê nirxandiyê. Rojnamê herwaha gotiyê, di demekî de ku Serok Barzanî li Bexda bûye ji bo hevdîtin û civînên li ser hev li gel hejmareke zêde ji berpirsên Dewleta Îraqa Federal û rêvebirên hêzên siyasî, ku serdaneke gelek gerim bûye, di heman demê de Serokê YNKê Bafil Talebanî, bi serdanekî li Bexda bûye û li gel hejmareke kêr û sînardar ên rêveberên Erebên Şîte civînên wî hebûye, bi taybetî li gel serokê Milîsên Esaîba Ehlê Heq Qeys Xez Elî bûye.

Çavkaniyên iraqî jî behsa derxistina Bafil Talebanî ji rojeva civîna rêveberiya dewletê kirin, tevî ku YNK jî beşek ji wê hevpeymaniyê ye.

Kurdo! Qedera Me Ye Ku Em Xwe Bikin Yek



K o n ê R e ş

Kurdo! Qey qedera te ye tu di welatê Mezopotamiya de hatiye çandin..! Li ser peravên herdu çemên bêrawestan; Dicle û Ferat hatiye danîn... Di navbera herdu çiyayên bi heybet û saw; Zagros û Toros de mezin bûye.. Di hêrik, newal û deştên te de genim hatiye çandin, sewal hatine xwedîkirin, tekellên erebeyan hatine çêkirin, şaristanî, lê hatine avakirin.. Nûh pêxember bi keleka xwe ji geliyê Laliş destpê kiriye, di ser çiyayê Şingalê re derbasî çiyayê Cûdî bûye û lê rawestiya ye.. Pêxember di nav xaka te re derbas bûne û jiyane ji xaka welatê te destpê kiriye..

Lê îro tu xemgînî Kurdo..! Ji çarhawêr ve tebayên daristanê êrîşî keriyên sewalên te dikin; kar û berxên te dikujin û dibêjin; şivan ew kujtine û xwarine..! Mezopotamiya bêje! Kî wan kar û berxan dikujî?! Kî wan keriyên di govê de kom û dîl

dikî..?!

Şivan bêrî ye, wek ku çawa gur ji xwîna Yûsiv bêrî ye.. Qey qedera te ye Kurdo ku roja îro tu şivan û kerî be..?!

Qedera te ye ku tu bi tena xwe, ala welatê Mezopotamiya bilind bikî.. Ma ne tu neviyê Waşokanî, Orkêş, Kewkebê Millan, Kepezê Kîkan û Qereçoxê Mosîsana ye.. Ma ne tu neviyê Mîr Bedirxan, şêx Ubêdellahê Nehrî, Şêx Abdulselamê Barzanî, Mele Selîmê Bedlîsî, Şêx Seîdê Pîran û Barzaniyê nemire.. Bêje, bê tê çilo wê alê di ser welatê xwe Mezopotamiya re bilind bike?

Erê, wek ku sofîyên kurdan dibêjin; qedera mirov li ser eniya wî hatiye nivîsandin.. Gelo li ser eniya me jî hatiye nivîsandin ku, em berpirsyarên bilindkirina ala welatê xwe bin..? Erê li ser eniya me hatiye nivîsandin ku, bilindkirina ala welatê me, perpisyariya me be.. Al, ala Mezopotamiya ye, ala xakê ye, ala zimanê Kurdî ye, ala biratî, wekhevî û mirovahiyê ye.. Ala hezkirin û lêborînê ye.. Û ev al nayê bilindkirin ku ne bi yekbûn û yekîtiya gotina kurdî be.. Nexasim di wiha qûnax û rojên dîrokî de, ku em tev di ber bilindkirina ala welatê xwe û hebûna xwe de berpirsyarin.. Û di rojên ayînde de, wê pirsyan ji me tevan bêne kirin, em ê tev di bin zêrevaniya dadgeha gelê xwe re derbas bibin..

Xuya ye hêjî pêdiviya me bi

Şêx Ehmedê Xanî heye, yê ku ji berî 350 salî ve li dor yekîtiya Kurdan wiha gotiye:

Ger dê hebiwa me itîfaqek, vêkra bikira me inqiyadek

Rûm û ereb û ecem tamamî, hemiyên ji me re dikir xulamî

Tekmîl dikir me dîn û dewlet, tehsîl dikir me ilim û hikmet

Temyîz dibûn ji hev meqalat, mîmtaz dibûn xwedan kemalat..

Kurdo! çima em fêr nabin?! Gelo raste em fêrî koletiyê bûne..?!

Şiyar be Kurdo, hay be Kurdo! Yekîti kilîta azadiyê ye, yekîti serxwebûn e, yekîti pêşketin û rûmet e.. Yekîti, hebûna Kurdên Rojava ye..

Qedera me ye Kurdo ku em bira bin; tu birayê min be, ez birayê te bim û ewên xiristyan (Siryani, Ermeni, Aşûrî û Kildanî) û ereb hevalên me bin û em tev zarokên Mezopotamiya bin, Mezopotamiya dayika me be, hêlîna me be û welatê me be..

Qedera me ye Kurdo ku em bê bê elektrîk, bê Petrol (gaz, mazot û benzîn) bijîn û rojên xwe derbas bikin, xwe li ber ronahiya çirayên Nisêbînê gerim bikin..! Qedera me ye Kurdo ku em xwe ji berjewendiyên xwe yên kesayeti dawêşîn û xwe bikin yek, gotina xwe bikin yek û li ber xwe bidin, di ber hebûna xwe de li Rojava pîkol û berxwedanê bikin, ji ber ku dîrok dilovaniyê nake û bela zarokên me gazin û loman ji me nekin.

Serok Barzanî û Mihemed Hacî Mehmûd pêşatan gotûbêj dikin

Serok Barzanî û Serokê Partiya Sosyalîst Demokrat a Kurdistanê pêşatên dawî yên li



Herêma Kurdistanê û Iraqê gotûbêj dikin.

Baregehe Barzanî belav kir, Serok Mesûd Barzanî îro 9ê Tîrmehê pêşwazî li Serokê Partiya Sosyalîst Demokrat a Kurdistanê Mihemed Hacî Mehmûd kir.

Diyar kir jî, di hevdîtinê de rewşa siyasî ya Iraqê û pêşatên dawî yên li Herêma Kurdistanê û Iraqê hatin gotûbêj kirin.

Di ser Komkujiya Geliyê Zîlanê re 94 sal derbas bûn

Îro di ser Komkujiya Geliyê Zîlanê re 94 sal derbas dibin ku di rojên 12-13ê Tîrmeha



1930î de ji alyê artêşa Tirkîyeyê ve hat kirin.

Sala 1930î, di Komkujiya Geliyê Zîlanê de ku di belgenamêyên Komara Tirkîyeyê de wekî "Bûyera Geliyê Zîlan" hatiye tomarkirin, bi destê leşkerên artêşa Tirkîyeyê 44 gund hatin şewitandin û wêrankirin. Li gorî amarên fermî yên Tirkîyeyê, 15 hezar mirov hatin kuştin û bi sedan mal û gund hatin şewitandin û rûxandin. Pertax, Newala Kuştiya, Hesenvedal, Adaxeybê, Milk, Newala Fedê, Newala Bebo û Çaqirbeg navendên komkujiyê bûn.

15 hezar Kurd hatin kuştin

Li gorî amarên fermî yên Tirkîyeyê, 15 hezar mirov hatin kuştin û bi sedan mal û gund hatin şewitandin û rûxandin.

Lê şahidhalên wan rojan dibêjin, zarok û jin, kal û pîr bi giştî 45 hezar kes bûne qurbanî. Bi Qanûna Îskanê a 5ê Gulana sala 1932yan, çûn û hatina wan gundan heta 20 salan hat qedexekirin û bû destpêka mişextîkirina Zîlanîyan. Piraniya kesên hatin mişextîkirin di zindanan de canê xwe ji dest da. Hinek jî bi destê dewleta Tirkîyeyê hatin kuştin. Ligel qedexeyê Geliyê Zîlanê êdî bû tewla dewletê.

Qirxizên hawirde li gundên Geliyê Zîlanê hatin bicîhkirin

Di sala 1980yî de jî bi biryara Kenan Evren (7emîn Serokkomarê Tirkîyeyê), Qirxizên hawirde li gundên Geliyê Zîlanê hatin bicîhkirin.

Tevî tapoyan jî nikarin veşerin ser axa xwe Welatîyên Geliyê Zîlanê ligel ku tapoyên wan ên serdema Osmanîyan jî hene nikarin zewiyên xwe wergirin û veşerin ser axa xwe ku dewletê dest daniye ser.

Komkujiya Geliyê Zîlanê, piştî damezrandina Komara Tirkîyeyê duyemîn komkujiya mezin a li hemberî Kurdan bû ku ya yekem sala 1921ê li Qoçgirî hatibû kirin.

CPT: Ji ber şerê PKK û Tirkîyeyê 162 gund hatine valakirin

Berpîrsê Tîmên Aştiyê yên Civakî (CPT) Kameran Usman

bombebaranên Tirkîyeyê û li parêzgeha Dihokê bûne.

êrişan hatine valakirin.

Ew gundên hatine valakirin ên li dorûbera Metînê ev in, Mijê, Kevinemejê, Spîndarê, Dêreşê, Gîrgaşê.

Li gorî gotina Kameran Usman ji sedê 80yê zevî û baxên van gundan ji ber şer û pevçûn û bombebaran şewitîne.

Kameran Usman eşkere kir ku heta niha bi temamî 162 gundên herêmê ji ber şerê PKK û Tirkîyeyê hatine valakirin û metirsî heye 602 gundên din jî bîna valakirin.

Dêra gundê Miskê ji ber êrişan zerer dîtiye

Kameran Usman amaje bi wê yekê kir ku metirsiya valabûnê li ser gundên Xiristîyanan jî heye.

Kameran Usman behsa êrişên li ser gundên Xiristîyanan jî kir û wiha got:

Metirsî heye gundên Xiristîyanan jî bîna valakirin. Wekî nimûne ji ber bombebaran dêra gundê Mîskayê zerer dîtiye û metirsî heye ew gund jî were valakirin. Gundekî Xiristîyanan ku 15 malên wê hebûn, aniha kesek lê nemaye. Xelkê gund ne tenê Kurdistan ji Iraqê jî derketine."

Kameran Usman behsa qurbanîyên şerê PKK û Tirkîyeyê jî kir û wiha got:

"Ji sala 1991an heta niha 334 sivîlên Herêma Kurdistanê ji ber şer û bombebaran, topbaranên Tirkîyeyê canê xwe ji dest daye.

Her wiha 358 kes jî ji ber êrişan birîndar bûne.

Îsal jî 8 kes şehîd bûne û kesek jî birîndar bûye.



ragihand ku ji ber şerê Tirkîyeyê û gerîlayên PKKyê 162 gundên li ser sînor ên Herêma Kurdistanê hatine valakirin.

Ji destpêka sala 2024an heta niha 8 sivîl jî ji ber şer û pevçûnan hatine kuştin. Berpîrsê Tîmên Aştiyê yên Civakî (CPT) Kameran Usman li ser şerê PKK û Tirkîyeyê ji Rûdawê re axivî. Kameran Usman eşkere kir ku Tirkîyeyê îsal hezar û 76 caran Herêma Kurdistanê bombebaran kiriye.

Ji sedî 93yê êrişan bi balafirên şer bûne û êrişên din jî bi dron û topxaneyan hatine kirin.

Rêxistina CPTyê raporan li ser êrişên Îranê û Tirkîyeyê yên li Herêma Kurdistanê belav dike.

Li gorî amarên CPTyê Tirkîyeyê hezaran û 548 caran Herêma Kurdistanê bombebaran û topbaran kiribû. CPTyê di rapora xwe de amaje bi wê yekê kir ku piraniya

Piraniya êrişan li çiyayên Gare, Metînê hatine kirin. Îsal jî dorûbera çiyayên Garê û Metînê tê topbaran kirin û bombebaran kirin.

20 hezar donim zevî şewitiye Li gorî zanyariyên CPTyê gundên herî zêde tîna bomberankirin ev in, Berçê, Belava, Kanê, Aşkê Bêrê, Sergelê. Kameran Usman di berdewamiya axaftina xwe de behsa şewata zewiyên xelkê herêmê jî kir û wiha got:

"20 hezar donim zevî, bax û rez şewitiye, ew gund ev demek e hatine valakirin lê belê xelkê gund ji bo cotkariyê û xwedîkirina ajelên xwe bi roj diçûn nava gund.

Piştî şer li herêmê zêde bû û bombebaranê dest pê kir êdî xelk naçin ser zewiyên xwe."

Metirsiya valabûnê li ser 602 gundan heye

Li dorûbera çiyayê Metînê jî gelek gund ji ber bombebaran û



Xaylaza Reşîd

Hîvê, hîvê...

Hîvê, hîvê bêje min
Çi dike delalê min,
Razaye xewa kûr da,
Nakevime bîrê da?

Bêjê, bê delaliya te
Pir digirî bona te
Bêxew maye hişyare,
Bê deng û his dizare.

Bê melûle dilê wê
Eynî dilqê sêwîyê
Bê ez im hevala wê,
Direvînim xemê wê.

Bêjê, bê te bîr nake
Tevî tu kesa nake
Bê dimire kerr û lal,
Hêşîr, reben, stuxwar.

Xuraman
Camalqızı

İlk dəfə kəndimə gəldiyim, o il,
Ağladım, hönkürdüm, dinclik tapmadım..
Bu il gəldiyimdə aram olsam da,
Gecəni sübhədək yuxu yatmadım.

Sanki sükut çöküb kəndin üstünə,
Xaraba deməyə dilim gəlməyir.
Atamın qardaşı Cəlil dədəmin --
Qapısın acmağa əlim gəlməyir.

Sanballı kişilər illərə təslim,
Qapılar bağlanıb, yurd xarabadır,
Səslədim, səsimə cavab verən yox,
Doğma, əzizlərim görəndə hardadır?!

Bu hisslər çəkilməz, bir işgəncədir,
Yurdumuz, ruhumuz talan olubdur.
Biz varıq, bu yurdda artıq bizimdir,
Çəkdiyimiz əzab "yalan" olubdur .

Köksümə sığmayan həsrət söndübdür,
Azad ruhum yenə keçmişə qonaq.
Unutmaq çətin sə sabah işıqdı ,
Bu bir imtahandı, bəlkə də sınaq.

Adil
CefakesKƏNDİM, KƏNDLİK
QALMAYLBDI TA SƏNDƏ

Kəndim, kəndlik qalmayıbdı ta səndə,
Kənd deyilsən, sən daha kənd yerisən.
Kəbədən də, Məkkədən də daha çox,
Bizim üçün müqəddəs and yerisən.
Kənd deyilsən, sən daha kənd yerisən.

Sazı susub, balabanı çalmayan,
Bir daşı da daş üstündə qalmayan.
Otuz ildir heç bir dadı olmayan,
Zəhər kəsən, ağzımın qənd yerisən.
Kənd deyilsən, sən daha kənd yerisən.

Adil, həyat bir yalançı nağılmış,
Fəlakətmiş, bu hər dərddən ağırılmış.
Leylak kimi çöp yuvası dağılmış,
Perik düşən ruhumun bənd yerisən,
Kənd deyilsən, sən daha kənd yerisən.

Fransa
Karîna Osêyan

ÇÎYAYÊ KURMANC

Darê zeytûnê li sîngê te
Bûne hezar xal û xet
Em wa hatin hemêza te
Em te nadine kesî qet.

Şkeftên te mera bûn mal
Zinarên te mera mertal
Bibe ji mera tu cî û war
Em te bernadin qet tu car.

Hatin peranîyê gurê har
Li Kurdistanê bûye hewar
Em nadin darên zeytûnê
Heta hebe dilopek ji xûnê.

Çîyayê Qendîl heta Kurmanc
Milet rabûne dikin armanc
Ber xwe bide çîyayê Kurmanc
Emê li serê te daynin tac.

WELAT XWEŞ E

Wa ye av û tofan dikişin
Ji sînga Sîpanî jorda tèn
Siyabend benda Xacê me
Welat xweş e em ne tê da

Zivistan çû biharê mewanî
Kulîlk çêbûn li benda kanî
Xweş kirin derdor û xanî
Welat xweş e em ne tê da

Min baxçe çand û veda
Birûsk lêxist wêran da
Lê nebû şîntiya gul û dara
Welat xweş e em ne tê da

Məhəbbət
KəlbəcərliHƏR KİTABDAN BİR
YARPAQ... . ÜSTƏ

Sinəm döşənəydi qədəmlərinə,
Göyərüb bitəydim yolların üstə !
Gözlər qan salaydı kəndə, kəsəyə,
Qaçıb "doğranaydım" xalların üstə !

Baxışın sinəmdə ocaq çataydı,
Görəndə canımı əsmə tutaydı.

Payız bû ne bihar e
Bû zivistan berf dibare
Bêmal bêwar û wêran e
Welat xweş e em ne tê da

Dilê min derbeder e
Li kolanên vala digere
Dike qêrîn û hawar e
Welat xweş e em ne tê da

Kesî negot ev çi hal e?
Em bûne feqîr û jar e,
Hawar û sed hawar e,
Welat xweş e em ne tê da

Penaberî û xeyalên perçe
Bextewarî dereng ma ji me
Lê zimanê me dewlemend e
Welat xweş e em ne tê da.

TU BI KURMANCÎ ZANÎ

İro yekî ji min pirsî
Gelo tu bi kurmancî zanî ?
Bêjin ji min re hevalno
Ez çi bersivê bidime wî ?

Rupela min, nexş bi nexş
Bi kurmancî xemilî ye
Min ken, şahî, êş û birîn
Bi kurmancî nivîs ye

Xerîb koçber û penaberim
Bi kurmancî dimeşim
Erf, edet û hemû qanûn
Bi kurmancî derbas dikim

Û roja kû bê xatir xwestin
Bi kurmancî ruhê xwe bidim
De bêjin min re hevalno
Ez çi bersiv bidime wî ?

WARÊ MIN

Derdê dilê min giran e
Ne mirî, ne jî giyan e
Ezdayî me, kar giran e
Jiyan her barê giran e

Barê giran li ser milan
Bi koçemalî baz didan

Zordest li warê min diman
Min hewar digehand Yezdan

Kanê û ka ye warê min?
Kanê baxçe û baxê min?
Ketin ber talan çûn ji min!
Ax tev rûxandin warê min!

War ket destê hov û guran
Pel ji daran weşiyar
Çilmisin kulîlkên mêrgan
Min xêr nedî ji xweşiyar

Bêjin, kanê ew warê min?
Birakujê me pir dibin!
Ters nabin, bi şûra dibin
Çima nayên hewara min?

Ez Ezda me, kûda herim?
Wenda kirin rê w dirb li min
Kanê ew Kurdistan min?
Ew cih û warê bavê min!

Bê war mam, derb lê ketin
Bêxwedî man, şof pê ketin
Gur û rûvî pey min ketin
Nîne hedan û veketin

Ez Ezda me, wer ku bêjim
Bo Kurdistan xwîn dirêjim
Bo cangoriyan dibêjim
Xwîn rijand wek Fırat bêjim

Lê min nedît ew Kurdistan?
Dilim bûye tûrê xeman
Sebr û aram hew min diman
Bûme evdalê dertûlan

Dibêjim û her dixwînin
Bilbil dūr e ji baxê min
Deng nema ku bikim qêrîn
Ka ye Kurdistan, dibêjin?

Êşa dilê min bê hal e
Ez ê bimrim ne li mal
Laşê min li Sîpan xal e
Ezda me, li wir helal e

Min re dibêjin, tu Ezda yî!
Çima ji Kurdistan mayî?
Erê birano tu ka yî?
Bo Kurdistan di xew mayî?

Dodağım təpiyib, nitqim bataydı,
Yazaydın adımı "lalların" üstə !

İtir Məhəbbəti, gözündən itir,
Öldür, bu əzablı anlar bitir.
Adın yazıladı sətirbə-sətir,
Qanım çilənsəydi kolların üstə !

. KƏSİLSİN

Gözüm bir gözəlin dilində qalıb,
Yalvarın, qoymuyun sözüm kəsilsin !
Dərdimi deməyə əl üzüməmiş,
Üzüm ki tutmadı, üzüm kəsilsin !

Yoldu "qızqaytaran" telimi mənim,
Doğradı yar deyən dilimi mənim.
Sovurun çöllərə külümü mənim,
Sevgi dünyasından izim kəsilsin !

Məhəbbət, sağım yox, sol gözləyirəm,
Qolbağı vurmağa, qol gözləyirəm.
Düz bir ömürdü ki, yol gözləyirəm,
Tökün gözlərimi, gözüm kəsilsin !

Gelê Kurd di nav rojên giring de derbaz dibe. Kevir û berdên ku dorberê Kurdistanê girtibûn û Kurdistan kiribûn zindan, ev çend salin ku li parçeyekî ji cihê xwe liviyane. Êdî kes nikare kevîr û berdên ku ji cihê xwe liviyane, duwarê ku rûxaye, rast bike û têxe şûna xwe ya berê.

Dîroka gelê Kurd, di destpêka sedsala 21an de niha li başûrê Kurdistanê de tê nivîsandin. Dijminên gelê me, neyarên gelê Kurd hewl didin, dicivin, berxwedidin ku çerxa dîrokê şunda bigerînin. Ev hewl, ev berxwedanên neyar û dijminên gelê me êdî bê feyde ne.

Ji Mehebad û Kermaşan heta Sêwas û Rûhayê, ji Agirî û Dêrsim heta Qamişlo û Barzanê, ji Xaniqîn û Silêmanî heta Amed û Gencê, Kurdistan ev 200 salin bi seranser wêran bû. Kurd bi sedhezaran şehid dan, bi milyonan insanên me ji warên bav û kalan hatin dîrxistin. Bi sedhezaran, bi milyonan zarok û mindal sêwî man, bi sedhezaran dayikên me reş girêdan û şingirtin. Qewlên bi dehhezaran keç û xortên Kurd ne gihîştin cîh.

Lê ewqas êş û azab, cefa û êşkence wala neçûn. Ala Kurd û Kurdistan niha li seranserê başûrê Kurdistanê li her derê, ji parlamenê heta parêzgehên bajar, ji nehiyan heta gundan li dar e. Pêwiste gelê Kurd bi tevayî spardariya xwe bo Kek Mesud Barzanî, bo Mam Celal Talabanî, bo her du hukümetên Kurdistanê, bo peşmergeyên dilsoz û qehreman û bo bi deh hezaran şehîdên Kurdistan nîşan bidin. Pêwiste hemû Kurd bi hevra ev destkevtiyên dîrokî wek çavên xwe biparêzin û nehêlin ku dijmin û neyar destên xwe dirêj wan bikin.

Kurdistan dewletek e

Sed sal berê dijminên Kurdan, ji Kurdan jîrtir bûn, Kurd ne li ser hev bûn, belav û sistbûn. Li ser de jî dewletên mezin wek Britanya û Fransa aliyê dagirkeran girtin û dewletên peyk, wek Irak û Suriye avakirin. Ji ber wan sedeman Kurd windakirin û Kurdistan bû çar beş, çar perçe.

Niha sed sal şunda, 2 ji dijminên Kurdan, Saddam bi dagirkirina Kuweytê û karbidestên Tirk bi rêgirtina hêzên Amerikî şaşiyek gelek mezin kirin. Ji ber şaşiyên Saddam û Tirkan Kurd bi qezenc derketin.

„Yan Kurdistan, yan Neman“ bû şiar, nîşan û parolaya Kurdên başûr. Di destpêka salên 90î de Kurd, di nav çeperên dijminan da pencereyek vekirin; deng û hawara xwe gihandin cîhan. Îro, dehpandeh sal şunda cîranên Kurdan êdî ne tenê rejîmên dagirker û neyar in, her ûsa Amerika û raya giştî ya cîhanê ye jî. Kurd êdî şunda ne mecbur in ku li payitextên karbidestan, li Enqerê, li Tehran û Şamê meqerên xwe vekin, bona ku ji cudayetiya dijminan sîd û feyde bigirin û rîyek bo derve vekin. Ev guhertinên dawî rê didin Kurdan ku tîkiliyên xwe di nav xwe de baştir bikin û dijayetiya hevûdu nekin.

Kek Mesud Barzanî û Mam Celal Talabanî hemû plan û dekdolabên neyarên pûç kirin û di dîroka Kurdistanê ji niha de cîhên xwe yê pîroz girtin. Alians û yekgirtina hîlbijartin û referandûmê, civînên serkirdayetiya her 2 partiyên, civînên parlamena yekgirtî, bîryara hukumeteka hevbeş, bîryar û kiryarên pîroz in. Pêwiste her Kurdek piştigiriya vê prosesê, vê pêvajoyê bike.

Kurdîstana Başûr, bi parlamen-to û hukumet, bi sistema aborî, dadî û îdarî, bi dezgehên asayiş, bi polis û leşger, bi sistema perwerdekirin û tendûristiyê kî çî dibê bila bibê, bi xwe de facto dewletek e, dewletek bê îlan kirî ye. Ger Efganistan, Tirkmenistan û Ozbekistan; ger Gurcistan û Azerbaycan; ger Filîpîn, Ruwanda û Nijerya; ger Kirgîstan, Malezya û Endonezya dewlet in, Kurdîstana me, Kurdîstana Başûr ji

wan ne kêmtir e, ji wan dewlettir e.

“Xetên sor” ya dewleta Tirk pûç bûn

Siyaseta dewleta Tirk li beramberî Kurdan pûç bû. Tirkîyê, bona ku Kurd jê sîdê negirin, rîya hêzên Amerikî girt û nehîşt ku ev derbazî Kurdistanê Başûr bin. Ev jî bo Kurdan baş bû. Ev cara yekem e ku Tirk şaşiyek baş û bi qezence Kurdan dikin. Ev şaşiyê Tirkan bo gelê Kurd pîroz û bimbarek be û xwedê Tirkan

bê şaşiyên wilo nehêlê!

Tirk bi tevayî, bê problem, bê mişgûle piştigiriya Filistin, Çeçenistan, Arnavutên Kosova dikin, bi dilûcan dewletbûna wan dixwazin. Lê dema ku dor tê Kurdan hemû bi hevra, çî kemalist û sosyalist, çî islamî û laik, dijî Kurdan dibin yek, dibin şovenîst, nîjadperest û rasîstên bê numûne. Ev ne tenê dijî daxwazên gelê me yê bakûr derdikevin, her ûsa dijî daxwazên Kurdên Kurdistanê Başûr jî derdikevin, dev davêjin wan jî. Hemû bi yekgirtî dibêjin mafê Kurdan nîn e ku, dewletek avabikin; mafê Kurdan tûne ku bi şeweyek federalî di nav Iraqek demokratîk û pirdengî da bijî. Gora raya wan tenê rîyek pêş Kurdan de heye: Ev jî nîrê kolektî ye, çî yê Ereba, çî yê Faris û Tirkan.

Derbarê Kurdan de terminolojiya militarîst û kemalist, islamîst û sosyalîstên Tirkan ji hevûdu ne gelek cûda ne. Ferqa wan tenê di nuansan de ye, di fiiliyê û pratîkê da ferqek mezin nîn e.

Tirkên ku heta ber çend mehan qala „xetên sor“ dikirin û damezrandina dewletek Kurdî, Iraqek federalî, Kerkûk û berjewendiyên Turkmenan li beramberî Kurdan wek sedemên şer û dagirkirina Kurdistanê Başûr bi navdikin, niha qet qala „xetên sor“ nakin. Ev jî nîşan dide ku „xetên sor“ ya dewleta Tirk li beramberî Kurdan pûç bûn, ber ku Kurd siyasetek baş meşandin.

Tirkîye, Îran û Suriyê mecbûr in siyasetên xwe yê qirêj li hemberî Kurdan biguhêrin. Yê ku naxwazin xwe biguhêrin, tîk gûhertin. Ber ku dem û wext hatin guhertin, ber ku dinya û cîhan ne ya berê ye.

Dinya, dem û wext hatin guhertin

Bi rûxandina duwarên Berlinê ne tenê şerê sar çû dawî û sistema sosyalîst hilweşiya. Her ûsa nexşeya siyasî ya cîhanê jî hat guhertin.

Kî dikaribû 15-20 sal berê texminbikira ku li Ewropayê dora 10 dewletên nû wê bînin avakirin?

Kî dikaribû 15-20 sal berê texminbikira ku reşik li Efrîka Başûr wê bibin desthilatdar û Timora Rohilat azad be? Kî dikaribû 15-20 sal berê texminbikira ku tekoşinên çekdar li Îrlanda, li Aceh û Endonezya biçin dawî û rîyên aşîtiyane vebin?

Û kî dikaribû 15-20 sal berê bigota ku rîya serxwebûna Filistinê wê vebe? Ev hemû guhertinên dawî jî nîşan didin ku, dinyaya me, dinyaya îro, ne ya duhîni ye, dem û wext, pîvan û nêrîn hatine guhertin.

...lê Kurdistan hên jî sêwî ye

Dema meriv nexşeya siyasî ya cîhanê binêre, dibîne ku îro dora 200 dewletên serbixwe hene. Ger mirov hêjmara Kurdan wek 35 milyon berbiçav bigre, dibîne ku ji wan 200 dewletan, ku nifûsa wan, ehlê wan ji ya Kurdan zêdetir in, tenê 32 dewlet in. Nifûsa 168 dewletan, ji ya Kurdan kêmtir in. Ji wan 200 dewletên ku niha endamên UN, netewên yekbûyî ne, 37 heb nifûsa wan ji 1 milyonê kêmtir in.

Kî wan dewletan nasdike? Sao Tome û Prinsîp, Seyselen, Antigua û Barbuda, Aruba, Bahamas, Barbados, Belize, Dominica, Grenada, Antilyaya Hollanda, St. Kitts û

Nevis, St. Lucia, St. Vincent, Virgin Îsland, Andora, Kanalinsel, Grönland, Samoya Amerikî, Polonezyayê Fransa, Guama Amerikî, Kiribati, Marshallinsel, Mikronesien, Neuekaledonien, Palau, Samoa, Tonga û Vanuatu.

Nifûsa van dewletan ji 200.000 kêmtir e. Her yek ji van 28 dewletan, qasî Zaxo nakin, lê ew wek dewletên serbixwe û soverên tîk naskirin û 35 milyon Kurd ji vê mafê

Irak a Federal. Û Kurd di nav hukumeta hevbeş da bi xurtî cih digirin.

Îro ne, lê sibê, şerê di navbera Sunnî û Şiiyên Ereba derkeve û Irak bibe gola xwînê, pêwiste Kurd çî bikin?

Îro ne, lê sibê, aliyek ji Ereban, an jî bi tevayî bêjin, em Irakek Federal naxwazin û dest bavêjin destkevtiyên Kurdan, pêwiste helwesta Kurdan çî be û ji Kurdan çî tê

rolek biçûk bigre ser milên xwe.

Yekitiya Ewropa dikare, bo avakirina dezgehêk parastîne wek OSZE (AGÛT) li Rohilata Navîn dest bi kar bike, ber ku Rohilata Navîn goristana kêmtewê û gelên bindest e, ber ku wek minak mesela Kurd çar dewletan alakadar dike, ber ku istikrara herêmê bi demokratîsekirina dewletên Rohilata Navîn û çareseriya pirsên gelên bindest derbaz dibe ûhwê.

Nifûsa 168 dewletan ji ya Kurdan kêmtir e



bêpar in? Ma ev adalet e?

Ger mirov wek pîvan, wek kriter mezinbûna welat û erdê bigire jî, tabloyek wek ya jorin dibîne. Erda Kurdan ji 500.000 kîlometrekare (km²) mezintir e. Ji van 200 dewletan, tenê erdê 22an ji Kurdistanê mezintir in. Gi gotinek din 180 dewletên cîhanê ji Kurdistanê biçûktir in.

Ger kriter û pîvan dewlemendiya binerd û sererd be, ji Kurdistanê dewlemendtir çend welat hene? Ma Kurdistan ne deryaya ava şîrîn û neftê ye?

Kurd li ser erda xwe, li ser warê bavûkalên xwe dijîn. Teritoriuma wan li ser hev e, yekgirtî ye, ne belav belav e. Zîmanek Kurdan heye û ev jî ji ya rejîmên koledar cuda ye. Navbera Kurdan de ji ali çand û kulturî de, ji alî dîrokî û historî de pêwendî û bingehên xurtirîn hene.

Dema ku qala Kurdan dibe, hinek dibên, mesele gelek girift e, tevlihev e û dema avakirina dewletên netewî bihûriye. Ev hêz û ev kes derevan û durûtiyê dikin.

Raste, di sedsala bûhuri de, sedsala 20an de bi dehan dewletên netewî sazûn û ev proses bi gelemperî çû dawî. Lê hin gel hene, ku tekoşina wan hên jî berdwam in. Ji van gelan yek ji Kurd in.

Ger dema dewletên netewî derbazbuji be, ev dewletên ku ev deh salin li Ewropayê avabûne çî nin?

Hirvatistan, Slovenya, Bosna û Hersek, Estonya, Litvanya, Letonya, Slovekyaya kîngê û li ku avabûn?

Rîya dewletbûna Filistinê, kîngê vebû? Timora Rohilat ne li vê dinyayê ye? Rêya dewletbûna Albanên, Arnavutên Kosova, kîjan hêz vedikin? Ma ev ne dezgehên wek UN, NATO, OSZE (AGÛT), Konseya Ewropa û Yekitiya Ewropa (EU) nin?

“Kes nikare gelekî, xelkekî di nav rejimek zordar da bigire”

Mirov qebûl bike an neke, îro Irak 3 beş e, ev fakt û rastiyek e. Kurd ne Ereba in, û Ereba jî ne wek hev in, di nav Şii û Sunniyan da bi sedan salin mişgûle û pîrgîrekên mezin hene.

Kurd bi dilsozî piştigiriya Irakek Federal dikin û hemû hêza xwe bo vê armançê pêşkeş û amade dikin. Di hîlbijartina meha Yekan da, di referandûma meha dehan (2005) de bi hemû hêza xwe beşdarbûn.

Di 80 saliya dewleta Irakê de cara pêşin hîlbijartinek demokratîk û adil pêk hat û Kurd 77 Parlamenter şandin Parlameta hevbeş ya Bexdayê û Kurdek, Birêz Mam Celal Talabanî bû serokê Komara

xwestin?

Dema ku Serokê Kurdistan, birêz Mesud Barzanî dibê, “eme heta dawiyê xwe biparêzin”, bê heq e?

Gotina sefirê berê ya Amerika li Hirvatistanê, Peter W. Galbraith, ku li pişt hîlbijartina meha yekan û referandûma ku li Kurdistanê pêk hat û jî sedî 98% Kurd bo serxwebûna Kurdistanê deng dan, gotiye ne rast e? Galbraith dibêje: “Dersên ku Amerika ji Yugoslavya’yê vergirtiye ev e: Kes nikare gelekî, xelkekî di nav rejimek zordar de bigire”.

Piraniya dewletên Ewropî dijî avakirina dewletek Kurd derdikevin. Ma dikarin ev bêjin, dema sibê erîşek li ser Kurdistanê Azad destpêbike tewr û helwesta wan çî dibe? Kurd çî bikin? Stûyê xwe dirêjî celladan bikin?

